

Êvar baş ampûla elektrikê 2011

Rê zanîn a Sazûmana Enerjiyê li ser ronahiya / şewqa nû

Cîhan di ronahiya / şewqa nû de

Niha dibe ku yek bi ser te re ye. Herweha mumkin e ku çendîn di odayê de hene û bi giştî dibe ku 42 heb di mala te de hebin. Erê, bêguman ez li ser ampûla elektrikê diaxifim.

Niha, gava li derve dema herî tarî ye, pêwîstiya me bi ronahiyê ji her der demî zêdetir heye. Em ampûla elektrikê pêdixin ji bo ku em baştir bibînin, ji bo ku em xwe baştir hîs bikin û ji bo ku em atmosferek baştir peyda bikin. Lê herweha tiştek din jî li paş ronahiyê heye, ew jî ew e ku ronahî gelek elektrikê dide herckirin. Bi taybetî jî hin ampûlên lektrikê gelek zêde elektrik herc dikirin. Wekî nimûne ampûlên elektrikê yên kevn. Ji hemû elektrik a ku diçû ampûlê ji % 10 dibû elektrik, tevayiya din tenê dibê germî. Ji bo vê tevayiya welatên endamên Yekîtiya Ewrûpa (YE) bi rêya - biryara parastina hawîrdorê, li hevûdu kirin e ku ampûla elektrikê ya kevn neyê firotin. Biryara parastina hawîrdorê bi maneya xwe ya hesanî - tê maneya ku tiştên ku gelek enerjiyê herc dikin, di nav wan de jî ampûla elektrikê ya kevn nekeve bazarê de. Ji aliyekî ji bo te jî biha ye, li aliyê din jî, ji bo hawîrdorê û xwezayê jî ne baş e.

Ampûlên me yên elektrikê girêdana wan bi rewsa xwezayê ye heye. Ronahiya / şewqa ji ampûlên elektrikê tê ji % 20 tevayiya bikaranîna elektrikê global ango ya cîhanî digre nav xwe, herweha elektrika ku tê ampûlan û em bikar tînin bi taybetî ji wan bîngehên enerjiyê tê ku germiya cîhanê zêde dikin. Pêwîstiya me bi ronahiyê heye, lê herweha pêwîstî heye ku em ronahiyek li ser bîngeha teknîka nî bikar bînin a ku dikare îmkanên zêdetir jî bide me.

Em – sazûmana Enerjiyê kar dikin ji bo ku em enerjîya me ya heyî efektîvtir û bihêztir bikar bînin. Em vê yekê bi alîkariya teknîka efektîvtir û bihêztir a enerjiyê, hevakeriya li gel welatên din û şaredariyên tevayîya Swêdê pêk tînin. Em

şîretên konkret û zelal didin şîrketan û te wekî kesayetî – kesê ku dikare tesarufa enerjîyê bike.

Bi vê rojnameyê em dixwazin bi te bidin zanîn ku çawa em di pêvajoyek balkêş de ne ku guherandina teknikê ber bi pêş ve lidar dikeve. Çawa ampûla te ya di metbexê de girêdanek xwe ya global ango cîhanî heye. Herweha cawa em dikarin xaniyên nû ava bikin bi ronahî / şewqa enerjîya efektîvtir û bihêztir û ronahiyek afirandêr / berhemdar lidar bixin.

Ji bo vê yekê em dibêjin – Êvar baş ampûla elektrîkê. Û biyanî baş, sibeh bi xêr ronahî / şewqa nû.

Anita Aspegren
Berpîrsa demî ya sazûmana Enerjîyê

Desên a jîngehê dê sê Swêdan di sale de tesaruf bike

Ampûla elektrîkê gelek elektrîkê bikar tîne, ji bo ku karê xwe bike. Ew ne bi tenê ye jî. Telewîzyonên bi vî awayî jî pîrr in, wekî şarjên pîlî û perwaneyan. Niha divê ew aletên ku enerjîyê gelek herc dikin ji bazarê bîrên dîrxistin, bi alîkariya biryara Yekîtiya Ewrûpa (YE) ji ber ku alternatifên gelek baştir hene. Heta niha biryar a desen a jîngehê li ser 13 grubên aletan hatiye dan û gelek aletên din jî di dorê de ne.

Li ser wan 13 grubên aletî Yekîtiya Ewrûpa biryar daye ku desen a jîngehê û nîşana enerjî bê bikar anîn û ev yek wê weha bike ku di sala 2020an de salane 383 TWh enerjî bête parastin. Ev tê maneya wê ku hema hema biqasî sê caran elektrîk a ku Swêd salan e niha bikar tîne kêmbibe*. Tenê biryara li ser ampûla elektrîkê weha dike ku kêmkirina bikaranîna enerjîyê di salê de dê 39 TWh be.

- Bikaranîna elektrîkê ya salane 2010an li Swêdê 132TWh bû.

Xaniyên me divê cazîb bîrên hîs kirin

Li çiftlikekê li ramstena nêzîkî bajarê Örebro malbata Eva û Magnus Häll li gel du zarokên xwe û pîsikeke xwe dijîn. Di nav malê de Elsa ya sê salî bisikletê xwe ya pembe ya dafdanê bi dengel bilind dajo. Di heman demê de brayê wê yê mezin Olof bi merqa guhdariya mezinan dike.

Mala malbata Häll bi awayek xweşik hatiye desen kirin, mobilyayên antîk, mûmê stearin û lambayên biçûk di şibakeyên / pencereyên wan de. Du pîspor zanîne

didin wan ku çawa dikarin elektrikê tesaruf bikin, bêyî ku guherandinek di atmosfera / desen a xaniyê xwe çêbikin.

Karin Fant – ji sazûmana Enerjiyê û desenkar a ronahiyê Natalie Bell serdana malbatê dikin, li rewsa ronahiyê ya male temaşe dikin û pêşniyaran ji bo başiyê dikin. Ber çav e ku teknika nû îmkânên baştir û bihêztir pêşkeş dike.

- Niha mirov dikare hilbijêre ku ronahiyek çawa bikar bîne, sar an germ, girêdayî pêwistiya û atmosferê çawa di odeya xwe de pêk bîne. Baş dibe ku mirov tecrube bike, abajûr bi xwe jî tesîrê li ronahiyê dike. Ev gotinên Natalie Bell in a ku di laboratory ya ronahiyê de mamostetiyê dike, herweha di dibistana teknîk û tenduristiyê ya KTH de (Zanîngeha Bilind a Teknikê ya Qraliyetê ya Swêdê)

Gerek a xanî li mala Eva û Magnus diyar dike ku wan di kêmkirina xerckirina elektrikê de gelek gav avêtin e. Eva ji tiştên antic hez dike û gelek ji techizatên ronahiyê baş kevn in. Bi ser vê yekê de jî ronahiya wan ji ampûlên ku kêmkirina enerjîyê serf dikin tê, ji xwe ampûl xuya nakin ji ber ku bi qûmaş an jî abajûr bi ser wan de heye. Jib o ku tiştên antic bi teknîka nû ronahî bike, qet problem nebûye. Tiştê ku Eva ne razî dike ew e ku hin ampûl ên li pencereyê ne, her dem dive pêketî bin.

- Ez dixwazim gava ez êvarî hatim male, xanî ji min re cazîb were. Ev gotinên Eva ne. Lêkoler ji wê re dibêjin ku baş dibe ger saeta otomatîk a rawestandina ronahiyê deyne. Ji wan re ev yek hesani ye ji ber ku niha jî ew saeta otomatîk a rawestandina ronahiyê ji bo ronahiya advent bikar tînin.

Magnus çend ampûlên ku kêmkirina enerjîyê serf dikin tine, Karin cudahiya wan îşaret dike. Di hin ji wan de tîlên ronahiyê xûya dikin, hin ji wan jî di rengê ne zelal de ne, ji ber wê tîlên ronahiyê xuya nakin, ango wekî ampûlên kevn xûya dikin.

Karin dibêje ku: Yên ku rengê ne zelal in hîssek nerm didin mirov, lê reng weha dike ku ronahî gelek xwe diyar neke. Yê ku tîlên wan ên ronahiyê xuya dikin efektîvtir û bihêztir in.

”Niha mirov dikare hilbijêre, ampûl ronahiyek çawa bide – sar an germ”

Karin dibêje ku: pêşî li ser qotiya ampûla agahdariya li ser ampûlê bixwîne û bibe xwedî zanyarî.

Pasî dibêje ku di rastiyê de her dem mirov bi kar e ger tevayiya ampûlên elektrikê yê kevn biguhere. Ampûlên ku kêmkirina enerjîyê serf dikin û lampayên LED ango lampayên nû yê zirav – lysdiod lampa – dikarin wekî ku biha ne xuya bikin, ji

ber ku hîn jî çêkirina wan biha derdikeve û bihayê wan jî girantir e. Lê herweha ew di nav demê de mesrefa xwe gelek gelek caran zêdetir derdixin, ji ber ku jiyanê wan gelek dirêjtir e û enerjîyê jî kêr serf dikin.

Karin dibêje ku: Tu dikare li ser ampûlê roja bikaranînê binivîse, bi pênuşek ku nayê jê birin. Wê demê tu zanî çî rojê te destpêkir ku ampûla kêr enerjî serf dike, te bikar anî û fiş a kirînê jî navêje, biparêze. Ger ampûl berî dema diyarkirî bişewite, tu dikare reklamasyonê bide.

Herweha ew dibêje ku mirov dikare li gel şewirmendê saredariyê yê li ser enerjî î jîngehê pipeyîve ku çawa dikare ronahiyek enerjîyê ya efektîvtir û bihêztir bikar bîne. Gava mirov ampûlan dikire baştir e biçe dikane ku lampa û ampûlan difroşe ku bibîne di abajûran de şewq çawa dide.

Li gor dîtina Natalie ya baş ew e ku: Mirov divê ampûl û lampayên LED ango lampayên nû yê zirav bikire. Ji bo ku di pêvajoyê de tesarufa wan baştir e.

Bêguman tesîra bikaranîna elektrîkê li bihayê mehane gelek heye. Şîret a herî baş ew e: gava tu ji odeyê derdikeve ampûlê vemrîne û êvaran ampûlan pêketî nehêle.

- Ez pê dixim, lê tu di vemrînê e – Magnus ji Eva re dibêje ya kulî ser van gotinan dikene.

Kêfa wê ji pêxistina mûm an re, ronahiya sivik û nerm re tê, lê ya wî berewajî divê ronahî be, bibîne ku çî dike. Lê li aliyê din ew di vemirandina ampûlan de gava ji odeyê derdikeve baştir e.

Gava piştî demekê derdikevin devera ku nû çêkirin e, Eva ji lêkoleran dipirse ku bastirîn ronahî li vir dikare bibe çî? Dibe ku lampayek ku li binban daleqandîbe?

- Nizanim, gava ronahî ji jor ve tê erd dibe fokus. Xweşiktir e ku lampa bi dîwêr ve bin, ew wilo dike ku ronahî dide derdora derî, gava mirov tê malê. Ev dîtina Natalie ye, û dibêje ronahiyek weha dîwaran diyar dike û xweşiktir xuya dike.

Eva û Magnus li ser pirsê ronahiyê, sîh a ronahiyê dibin xwedî gelek agahdarî. Natalie pesnê wan dide ku ew guh didin şîretên wan ku her deverî neyê ronahî kirin. Ronahiya rehet enerjîyê baştir diparêze.

Şîretên zanyaran ên herî baş

Metbex:

Ronahiyek baş li ser cîhên ku kar li ser dibe, divê hebe. Wekî: dezgeha firaxan û firin. Lampaya floransê yan jî ampûl û lampayên LED ango lampayên nû yê zirav, ew gelek cîh jî nagrin. Li mala malbata Häll ji bo her lampaya floransê şartêlek heye. Ji bo ku gava dixwazin vêxin û vemrînin.

Odeya rûniştinê

Mobilyayan weha bicîh bike ronahiya rojê jî bête bikaranîn, wekî nimûne qoltuxê xwendinê nêzîkê pencereyekê deyne. Ronahiya kêmtir ji ya zêde atmosferek baştir ji bo rehetiyê dide û erzantir jî dibe. Lampayên biçûk li cîgahên cuda di odeya rûniştinê de, odayê ferehtir û kurtir dide diyarkirin.

Odeya cilan

Li vir ya herî baş ew e ku ronahî otomatîk pêkeve û vemre, gava mirov gelekê caran dikeve û derdikeve hundir. Ev ji bo qata bodrumê û cîhê cilşîştinê jî derbas dibe.

Odeya razanê

Ger mirov li odeya razaê cilan jî prova bike, divê ronahiyek weha be ku reng xweş bêtin dîtin. Ji bo vê li ser qertona yan jî pakêta ronahiyê li nîşana – Ra temaşe bike. Her cend nêzî 100 Ra be, ewqas reng zelaltir xuya dikin.

Odeya zarokan

Pêşî bizanibe ku zarok ji ronahiyek çawa hez dikin û paşî ronahiya odayê desen bike. Ronahiya germ ji y asar zêdetir rehetiyê dide. Lampaya razanê li ser textê razanê di sewiyeya cavan de be û di nav durayiya odayê de be baş dibe. Wê gavê zarok odayê baştir dibîne û gava şiyar bû baştir dikare tevbigere.

Bexçe, der

Bihêle ku ronahiya rojê bexce yan derve ronî bike. Herweha tu dikare ronahiyek nerm ya ampûlên ku kêr enerjî serf dikin jî bikar bîne. Ronahiya nêzîk gava ku mirov nêzîkî tiştekî dibe xuya bike baştirîn alternatîf e.

Tu ewqas tesseruf dike

Lampaya Halojen

Ji % 30 – 50 tesseruf dike

Lampaya halojen navê xwe ji wê maddeyê girtiye ku di derdora têla elektrîkê de ye. Îro di bazarê de tu lampayên halojen dikare bibîne ku dijibihin ampûlên elektrîkê yê kevn, herweha wekî mum-lampayan jî. 2 -3 caran ji ampûlên kevn ên elektrîkê zêdetir jiyana wan heye.

Ampûlên kêrî enerjî serf dikin

Ji % 75 – 80 tesseruf dike

Ampûla kêrî enerjî serf dike, ew e ya ku wekî boriyek ronahiyê çendîn caran hatiye zivirandin, bi yan tel ên di navbeynê de. Ew ji ampûla kevn a elektrîkê ji % 75 – 80 kêmtir elektrîkê serf dike. Herweha deh caran ji ampûlên kevn ên elektrîkê jiyana wan dirêjtir e.

Lampayên LED (lampayên nû yê zirav)

Ji % 85 tesseruf dike

Lampaya Lysiod yan jî wekî niha – Lampaya LED (lampayên nû yê zirav) tê binavkirin, zû pêşdikeve. Wekî alternatif a ronahiyê ya herî efektîv û bihêz tê qebûl kirin. Ji lampaya kevn a elektrîkê 25 caran jiyana wê dirêjtir e. Ciwa ango zibeq di nav de tune ye.

Ronahiya di nav welat de

Ronahiya êvarê ya efektîv û bihêz her diçe zêdetir dibe

Te zanîbû ku ji % 25 mesrefa bajarvaniyê ya mesrefa kargeriya û lênerîna diçe ronahîkirina caddeyan û ronahîkirina parkan? Ji bo vê bajarvaniya Grästorps tevayiya lampayên caddeyan û parkan guherand. Bêguman herweha şert jî li ber hebûn ji bo kalîteya ronahiyê ewletir bibe, di parkan de, tunelan de û çar rêçikan de.

Di encama vê de, piştî bikaranîna lampayên ku kêrî enerjî serf dikin de mesrefa elektrîkê ji % 62 kêrî bû, herweha ronahî li gelek cîgahan jî baştir bû.

Ronahîkirina salonên sporê di qada bilind de

Dibe ku ji % 35 bikaranîna enerjîyê bête taseruf kirin gava bikaranîna enerjîyê ya rast li hawizên avjeniyê, salonên jimnastîkê û sporê û en tevlîhev bête bikar anîn. Evy ek salona sporê ya Bengtfors pêşengiya vê yekê kir û encam jî wergirt. Li vir enerjîya li gor pêwistiya hate bikaranîn, di caroweya sistemê de ku dikarî ronahiyê li gor çî tişt li salona sporê tê kirin organize kir. Ronahiya di jimnastîka giştî tê kirin – kêr, û maçên bilind de – zêde, li gor pêwistiya hatin pêkanîn. Bi vî awayê sistema rewşen, di salona sporê ya Bengtfors de ji % 60 enerjî hate taseruf kirin.

Ronahiya nû, du caran serkeftinê bidest dixe

Ronahiya di dikanekê de divê ne tenê ” hebûna ronahiyê ” be. Mişterî jî divê xwe rehet hîs bikin û tiştên tîn firotin jî xwedî ronahiya pêwîst bin. Di dema ji nûve avakirina dikanekê de li Başûrê Stockholmê ronahî jî ji nû ve hate cîhbicîh kirin. Ji cîhê lampayên û lampayên floransî, lampayên techîzata modern a ronahiyê hatin cîhbicîh kirin û ronahiya taybet a di pêwistiya dikanê de. Niha ronahî rehetiyek xweştir dide û firotin jî baştir bûye, herweha bikaranîna enerjîyê 200 000 kWh / di salê de – kêr bû, ya ku hate maneya 250 000 Kron kêmtir di salê de.

Ronahiya te ya malê weha herc dibe:

Ronahiya giştî : ji % 26

Elektronik a malê : ji % 26

Sarince û dolaba qeşayê : ji % 22

Wekî din : ji % 26 (makineya cilşîştinê, makineya firaxşîştinê, çêkirina xwarinê, û h w d)

Hewl ji bo serkeftina dawîya hefteyê bide!

Wekî ku te di tekst a jor de dît, lampa û elektronik a malê herî zêde elektrîkê herc dikin. Sarincok û dolaba qeşayê di cîhê duyem de tîn. Lê, tu dikare bikaranîna elektrîkê kêr bike, bêyî ku tesîrê lir oja te bike. Di dawîya hefteyê de temaşe bike û bibîne serkeftina te bi salan çawa dikare bibe.

Şeva îniyê

Niha gava tarî ye, binêre kîjan 10 lampayên te herî zêde pêxistî ne. Ger tu herî zêde wan 10 lampayan bikar tîne û tu wan bi lampayên ku enerjîyê kêr serf dikin, biguherîne, tu dikare mesrefa xwe ya elektrîkê salane 600 Kronan kêr bike. Pêşniyarek ew e, her car fiş a peredanê ya lampayan biparêze. Ger lampaya te kirî, berî dema diyarkirî bişewite, here dikana te jê kirî.

şemî

Telewizyon, computer û sinemaya male, ji çaran yek elektrika male mesref dikin. Gelek kes telewizyon û komputeran vekirî dihêlin, bêyî ku bikar jî bînin, ev yek di encama lêkolînek ku Sazûmana Enerjiyê kirî de derket hole. Tenê fêrbûna vemirandinê di êvarê de dikare gelek enerjîyê tesderuf bike.

Nîsana enerjîyê ya li ser tistan dikare bi me bide zanîn ku ew tişt çiqas elektrîkê herc dike.

Ew nîşan li ser firaxên spî yê elektronîk (sarincok, makîneyên şuştin û firaxan, dolaba

qesayê û h w d) û lampayan de jî heye. Niha li ser paketên telewizyonan jî, ew nîşan heye.

Gava te tiştekek nû kirî, meyzandina nîşana enerjîyê dikare alîkariya te bike ku tu pereyan û

enerjîyê jî teseruf bike. Zer tê maneya sade. Rengê kesktirîn tê maneya baştirîn encam ji bo

enerjîyê. Sor a herî ne baş e. Baş e ku mirov bide ber hevûdu. Telewizyonek dikare du caran

zêdetir elektrîkê herc bike, li gor telewizyonek din ku qalîteya wan wekî hevûdu ye. Evy ek

di encama lêkolîna Sazûma Enerjiyê de derket holê.

yekşem

Temaşekirina rewsa enerjîya mala xwe di troja yekşemiyê de, bi danîna termometerekê di dolaba qaşayê de dest pê bike. Ger di bin – 18 dereceyan de nîsan bike, bilind bike. Termometerê bixe nav qedehek av di sarincokê de (bas dibe ku qedeh serbest be, li derdorê tiştekek nebe). Ger ji – 5 sartir diyer bike, bilind bike. Her dereceyek sartir, di dolaba qeşa yan sarincokê de ji % 5 zêdetir elektrîkê herc dike.

Bere were bîra te

- () Guhêzbariya ronahiyê
 - () Vemirandina êvarê
 - () Nîşana Enerjiyê
 - () Pîvana sarincok û dolaba qeşayê
-

Ronahiya di dema Noelê / Cejna zayinê de ferqiyek mezin e

Mûmdankek 11 serî bi ampûlên elektrîkê yê kevn 43 caran zêdetir elektrîkê herc dike li gor ger tu biguherî ampûlên LED (ampûlên nû yê zirav). Evy ek di encama lêkolînek ku Sazûmana Enerjiyê laboratoriya testê - Testlab kirî de.

Lêkolînek din dide diyarkirin ku yek milyon malan ampûlên LED bermaberî ampûlên elektrîkê yê kevn hibijartin e, di stêrkên ku di pencereyan de deynin, şerîtên ronahiyê û dekorasyona ji bo Noelê, dikare 41 000 000 kWh tesoruf bike, ev tê maneya germkirina elektrîkî ya 2 700 vilayan di nav salekê de *.

Ger tu bixwaze li ser testên Sazûmana Enerjiyê baştir xwedî agahdarî be, li malpera energimyndigheten.se temaşe bike. Li wir encama biqasî 40 testan heye, ji stêrkên dema advent de û ampûlên enerjîyê yê nû heta hucreyên rojî.

- Em weha hesab dikin ku ronahî tevayîya rojê pêketibe di derdora mehekê de û ku vilayek di salê de 15 000 kilowatsaetan herc dike.

Rê zaniya ronahiyê

Ronahiya xwendinê

Lampayên kêr enerjîyê serf dikin – yan jî lampayên LED hibijêre, 430 – 1000 lm / 2700 – 4000 K. Ger techizat a te ji bo lampayên halojen reflektan hebe alternativên baş ji bo lampayên halojen hene, lampayên – LED û hin lampayên kêr enerjî serfdikin jî li wan tên.

Ronahiya şivê

Lampayên kêr enerjîyê serf dikin hibijêre, 430 – 800 lm / 2500 – 3000 K. 1000 lm zêdetir jî tu dikare hibijêre ji bo ronahiyek bihêztir. Ger tu bixwaze ronahiyek nermtir bikar bîne, bi mûmên stearin, tu dikare lampayên halojen hibijêre. Hin ji lampayên – LED bi hêza ronahiyek bilind jî dikare bête hibijartin.

Ronahiya giştî

Lampayên kêr enerjîyê serf dikin hibijêre, , 430 – 800 lm / 2500 – 3000 K. Ger di binban de spot – halojen hebin, alternatifên baş ên lampayên halojen hene, teknika – LED zû pêş dikeve, binere ku alternatifên LED ên nû yê çawa hene.

Ronahiya kar

Lampayên kê m enerjîyê serf dîkin an – lampayên – LED an jî lampaya floransê hîlbijêre, 430 – 1000 lm / 2500 – 4000 K

Ronahiya serşokê

Lampayên kê m enerjîyê serf dîkin ji bo ronahiya giştî hîlbijêre, 430 – 800 lm / 2500 – 3000 K. 1000 lm zêdetir jî tu dikare hîlbijêre ji bo ronahiyek bîhêztir. Ji bo ronahiya makyajê lampayên halojen – an jî lampayên – LED bi ronahiya spî ya germ yan jî rengê spî baş e (heta 4000 K.) Ji cîhê spot – halojen ronahî, lampayên halojen û lampayên – LED alternatîf ên baş in.

Ronahiya çêkirina xwarinê

Lampayên kê m enerjîyê serf dîkin an lampayên floransî ên ku rengan baş diyar dîkin hîlbijêre, 750 – 1000 lm / 2700 – 4000 K.

Ronahiya mijê

Hemû lampayên halojen dikarin rewşa mijê bidin. Gelekên lampayên – LED jî dikarin. Hin jî lampayên kê m enerjîyê serf dîkin jî dikarin, lê rewşa reng dikare di nîzmkirina mijê de bê guhertin.

Ronahiya rehetiyê

Lampayên kê m enerjîyê serf dîkin yan lampayên – LED hîlbijêre. 125 – 470 lm / 2500 – 3000 K. Gelekên lampayên – LED dikarin rewşa mijê bidin.

Bêje û mane**Şênkayî (lm) herîkirina ronahiyê dipîve**

Şênkayî (lm) pîvandina herîkirina ronahiyê ye, ango encama ronahiya giştî ya ku lampa dide dipîve.

Watt (W) hêzê dipîve

Çiqas watt bilind be lampa ewqas zêde enerjî serf dike, gava pêketî be. Di ampûlek elektrîkê de biqasî ji % 10 dibe ronahî ya mayî tenê dibe germî. Di ampûlê kêm enerjî serf dikin de, di lampayên – halojen de, di lampayên – LED de zêdetir ê elektrîkê dibe ronahî. Ev tê maneya, wekî nimûne ampûlek enerjîyê zêde serf dike yê kevn a ku 60 W bû, dikare bi ampûlek kêm enerjî serf dike a 11 – 13 W bête guherandin û her heman ronahiyê bide.

Kelvin (K) germiya reng diyar dike

Germiya reng a lampayê (rengê ronahiyê) bi Kelvin (K) tê pîvandin. Rengê ronahîyan bi giştî wekî spî yê germ û spî tîn binavkirin. Herçend dereceya reng bilind be rengê zelaltir dide û baştir tê xuyakirin. Çend bilind be ewqas ronahiyek sartir.

Ra rewşa reng diyar dike

Ra (Rendering average) pîvana wê yekê ye, çawa reng xwe di nav ronahiyê de didin diyarkirin ji lampayek diyar. Nirxa bilind a ku lampayek dikare bigre Ra 100 e. Lampayên niha tîn firoştin divê herî kêm xwedî Ra 80 bin.

Ji watt bo şênkayî ye

Ampûla enerjîyê zêde serf dike (W) Ampûla enerjîyê kêm serf dike, lampaya halojen, lampaya – LED *

15 W	120 – 135 lm
25 W	220 – 250 lm
40 W	410 – 470 lm
60 W	700 – 805 lm
75 W	920 – 1055 lm
100 W	1330 – 1520 lm
150 W	2140 – 2450 lm
200 W	3010 – 3450 lm

- Nirxên giştî. Ji bo lampayên reflector derbas nabe. Pîvandin li ser wî bîngehî ye ku şiklên lampayan ên cuda nirxên cuda didin. Lê, ew cudabûn bi awayek normal, bi dîtin kifş nabe.

Tu dixwaze zêdetir xwedî agahdarî be, ku çawa tu dikare teserufa enerjîyê li malê bike?

Li gel şêwirmendê enerjî û jîngehê kul i tevayîya şaredariyên Swêdê heyî bikeve têkiliyê de.

Berpirs ê projeyê: Cecilia Bertilsson û Maria Karlberg, ji Sazûmana Enerjîyê

Hilberandin: Granath Euro RSCG

Nivîsvan: Cecilia Bertilsson, Eva Anneli

Pîspor: Peter Bennich, sazûmana Enerjîyê, Nils Borg, Borg & Co

Ev agahdarî ya Sazûmana Enerjîyê ye.